

## Du civînên vê nêzîkê yên di navbera Serokê Partîya Civaka Demokratîk (DTP), Ahmed Turk û serokatîya Kongreya Netewî ya Kurdistanê li London-KY.

Di 20/04/2009an seet di 19.00an de li odeyeke parlamenta KY civînek di navbera Serokê Partîya Civaka Demokratîk (DTP) û serokatîya Kongreya Netewî ya Kurdistanê de pêk hat. Birêz Cewad Mellayê ku serokoê delegasyona KNK bû, careke din pîrozbahîyên serketina



mezin a gelê Kurd di hîlbijartinên Bakurê Kurdistanê de pêşkêşî Ahmed Turk kir û got ku rizgarîya netewa Kurd li hemû perçeyên Kurdistanê bi serfirazîya Bakurê Kurdistanê ve têkildar e.

Di civînê de her du alî li ser pêşketinên li Kurdistanê û girîngîya têkilîyên hevkarîyê di navbera hemû hêz û alîyên Kurdistanê de rawestiyan.

Hevrêyên ku bi Serokê KNK re tev li civînê bûn ev in: Birêz Brûska Îbrahîm, Xanim Irmgard Îbrahîm, Mohamed Saleh Kerkûkî, Xanim Homa, Birêz Sîrwan Kawsî, Birêz Yûsif Bakurî, Birêz Azad Mafco û Birêz Nabaz Tûrî.



Divê bê gotin ku rojek berî vê civînê, hevrêyên ji KNK

tev li semînareke li Haringey Green Lanes bûn: KCC (London) ji bo Birêz Ahmed Turk. Di dema semînarê de, Birêz Cewad Mella xêrhatin da Birêz Ahmed Turk û hevrêyên wî û bi kurtî armanc û nêrînên KNK li gel pirtûk û weşanên KNK pêşkêşî Birêz Ahmed Turk kirin. Hêjayî gotinê ye ku Birêz Ahmed Turk di axaftinên xwe de çend caran beşê Kurdistanê yê ji alîyê rejîma nijadparest a Tirk dagirkirî wek Bakurê Kurdistanê bi nav kir, ku ev yek tecrubeya wî ya têkoşîna sîyasî û partîzanîyê li gel asta bawerîya wî ya bilind bo welat û gelê wî nîşan dide.